

PÊWISTIYA HILANÎNA QÛTÊ ZIVISTANÊ



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Welat

ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة

العدد (٥٣) ٢٠١٨/٨/١ م

Welat
53
01/08/2018
Çandî - Giştî - Serbixwe

ROLA RAGIHANDINÊ DI STANDARKIRINA ZIMANÊ KURDÎ DE



1Welat



Rola ragihandinê di standerkirina zimanê kurdî de

Desteya sernivîs

Ji zû de, Kêşiya stenderkirina zimanê kurdî li bal hemû xemxurên vî zimanî cihê gengeşe û danûstandinê ye, gelo kengî û bi çi awayî emê bighêjin zimanekî kurdî stander ku hemû kurd li her çar parçên kurdistanê û seranserê cîhanê bi riya wî ligel hev bidin û bistînin herwiha binivîsin jî ?

Wek ku tê zanîn, sê astên ziman hene : zimanê gelêrî-zimanê ragihandinê-zimanê wêjeyê. Bi giştî û li bal hemû gelan zimanê stander ji zimanê ragihandinê dest pê dike, ji lewre dema mirov bixwaze zimanekî bighîne asta standerbûnê divê rola alavên ragihandinê berçav bigire.

Em tev dizanin ku pir ferq û cudahî di zimanê gelêrî yê kurdî de heye, ev diyardeyeke xwezayî ye, di hemû zimanan de peyda dibe, lêbelê pirs ewe; heya kîjan radeyê, ragihandina kurdî dikaribû zimanekî stander biafirîne, an nêzîkahiye lê bike ?

Dema ku em ragihandina kurdî bi hersê beşên wê yê (tê xwendin-tê bihîstin-tê dîtin û bihîstin) bişopînin, tev ku ji alî zimanê xwe ve gelek gav bi pêş de avêtine, lê hîn em nikarin bibêjin ku ew gihiştîye asta standerbûnê.

Parçebûna zimanê ragihandina kurdî di navbera du zaraveyên sereke-soranî û kurmançî- de ew pirsgerêka herî mezin e, di riya standerkirina zimanê kurdî de. Ji bo çareserkirina vê pirsgerêkê pêdivî bi biryareke siyasî heye, dibe ku ev çareserkirin jî demeke dirêj bixwe.

Heya ev dem bê, divê kar li ser standerkirina her

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- Mehane



Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Imran Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî

Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

Ji bo têkiliyê:
welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

zaraviyekî bi rengekî cuda bête kirin, lê divê di vî karî de, hewldana nêzîkbûnê di navbera herdu zaraveyan de berçav bête girtin.

Di derbarê alavên ragihandinê yê bi zaravayê kurmançî de, hîn em hin cudahiyên ziman dibînin, bandora zimanê gelêrî û hin devokên herêmî hîn li wan heye, ji alî rênivîsê û rêziman ve jî hîn ne yekgirtî ne. Ji lewre pêdivî bi hemehengiyeke giştî di navbera hemû alavên ragihandina kurdî de heye, da ku yek rêbaz, yek rênivîs û yek zimanî bi kar bînin, bi vî awayî em dikarin zimanê kurdî (zaravayê kurmançî) bighînin asta standerbûnê, û eger heman kar ji alî ragihandina kurdî ve li ser zaravê soranî jî bibe, emê bikaribin di demeke ne dirêj de bighêjin zimanekî kurdî stander. ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution



إنَّهَا الرمال

لقمان عبيد الرحمن

إنَّهَا الرمال ترمي في عيون الوقت أشلائها
تزحف جهة القلب

أو الرأس

لم يفلت من غزواتها أحد
والمأساة

لم تلد شعلتنا إلا القبور
في حلبة الصراع شقيق

يتبارزان حتى الموت
هو الراجح لا أنت

كيف اقنع رأسك المثقل بالنصر ؟
و يدك في الرمال

لا أحد ينكر انتماؤك
و وجودك

إنه الظلام . . .

خلع ثوبه ، و تمرغ بالتراب سبع مرات ، ثم
توضأ بالشمس و مضى

يا لها من مفارقة ؟

أن تولد تحت الشمس بلا شمس
حلمت أنني أمتطي موج الزمن

لكنه خادم فقير
متخما

ناضجا كـ رغيف تنور

تمدد على سرير امرأة تجيد الطهي ، لا تجيد
اللهو ينتظر عشاءه الأخير بعد منتصف الليل،

نام جانعا

حدث المحال

سقط الخوف

فاض الجب

جمع أشياءه

ركب صهوة الماء

إنَّ غابة الأفكار الناضجة

لا تحيا إلا بالعمل

للهافية تفودك الجهات

و الخابور يغني معك بلوعة :

((قلبي تحت ظلال الزل سرير سرخس و كزبر

و على ضفتي يلهو الرعاة

تشهد الدنيا أنني كنت ذا هيبة و بهجة

قبل أن تطال يد الرمل مائي))

يا بحر الغبار ، يا بحر اليباس ، الجفاف تلتف على

مدينتي خلاياك ، دع الحمام في بيوتها

تهتدي بالسراب

وجهك لم يعرف الضوء

رمتك الألوان

الجهات

العيون

ع

ظ

م

أ

تملى زجاجاتك بسائل الوقت

تقامر بها تحت جنح الليل

للشمس مسار واحد

لكن الشرق والغرب نقيضان

قلت لي مرة بغرابة : انطلقت أقتفي خطوات عاشقة

خطفها حبها ، بعد أن تسربت لقلبها بعض خلايا

الرمل ، وخرجت ذات يوم من مخدعها كحمامة

فردت جناحيها تقابل الشمس ، تتنشق عطر الصباح

، لكن بندقيتي قابلتها بالزفير

ZAYÎNA ROJNAMEGERIYA KURDÎ:



Izedîn Salih

Dîroka rojnamegeriya Kurdî ji sala 1989an ve dest pê dike, dema ku yekemîn rojnameya Kurd bi sernavê "Kurdistan" ji aliyê nivîskarê Kurd Miqdad Midhet Bedirxan ve, li Qahîreya paytexta Misrê hate çap kirin, ku wê hingê welatê Kurdistan "Kurdistan" du perçe bû, perçeyek di bin desthilatdariya Osmanîyan û yek jî di bin desthilatdariya Îranê de.

Belê, Miqdad Mideht Bedirxan di destpêkê de hewl da ku rojnameya Kurdistanê li Stembola Tirkîyê çap bike, lê desthilatdariya Ebdilhemîdê didwan rê nedayê ku rojnameyeke wiha çap bike, vêca Miqdad neçar ma ku berê xwe bide Qahîreya paytexta Misrê û rojnameya Kurdistanê li wir derbixe, ku rojname nîvmehane bû, û her hejmareke wê ji 4/ rûpelan pêk dihat, û zimanê wê yê weşanê jî Kurdî-Osmanî bû.

Bi vî awayî, yekemîn hejmara rojnameya Kurdistanê, di roja 22ê Nîsana 1898an de li Qahîreya paytexta Misrê hate çap kirin. Lê belê Padîşahê Osmanî, ji bo ku ev rojname li Misrê jî neyê çapkirin, giraniya xwe ya li wê derê bikar anî, û di encamê de, piştî çapkirina 5/ hejmaran, Miqdad Bedirxan neçar ma ku cihê rojnameyê ji Qahîra veguhêze bo Cinêva Swîsrayê, ku li wê derê 14/ hejmar ji rojnameyê bi rêveberiya Ebdilrehman Bedirxan "birayê Miqdad" hatin çapkirin. Lê di piştre, û ji ber sedemên nediya, cihê çapkirina rojnameyê careke din vegeriya Misrê, û 4/ hejmarên din (ji 19an û ta bi 23an) li Qahîra hatin çapkirin. Ji hejmara 24an û şûn ve, cihê rêvebirin û çapkirina rojnameyê dîsa bo Îngilistanê (England) hate guhertin, ku hejmara 24an li Londonê hate çap kirin, û hejmarên ji 25an û ta bi 29an jî li Folkstonê ya bakurê Ingilistanê hatin çap kirin, û paşê dîsa cihê rojnameyê hate guhestin û bo Cinêvê vegeriya, ku hejmarên 30 û 31ê li Cinêvê di sala 1902an de hatin çap kirin, û ew herdu hejmarên dawiyê yê rojnameyê bûn.

Naveroka rojnameya Kurdistanê baş dewlemend bû, û bal dikişand ser çand û dîroka kurdan, û rewşa siyasetê û civakî ya wê demê, herwiha gotarên balkêş û cûr bi cûr di barê perwerdehiya zarokan, hînbûna pîşe û hunerên nû, û hişyariya gelê kurd tê de hatine belavkirin. Ji aliyekî din ve jî, rojnameya Kurdistanê bang li Kurdan kiriye ku li hember sitemkarî û zordestiyê xwedî li welatê xwe yê Kurdistanê derbikevin, û sernivîserê

rojnameyê "Miqdad Midhet Bedirxan" tê de dibêje: "Kurdistan a kurdan e. Eger neyarek hat ser Kurdistanê, Kurd dê xwe li ser bidin kuştin, dêmek erdê wê derê kurd dikolin, darên wê derê kurd diçînin, karbidestên ku Padîşah wan rêdike ser serê we, pereyên wan kurd didin. Ji lewre ku Kurdistan ya we ye. Vêca eger we divê Kurdistan tim di destê we de bimîne, û jin û zarokên we reben û xizan nebin, divê hûn karbidestên sitemkar ji welatê xwe derbixin".

Desthilatdariya Osmanî xwendin û belavkirina rojnameyên Kurdî li wîlayetên Kurdistanê qedexa kiribû, lê dîsa jî rojnameya Kurdistan bi veşartî gihiştîye Kurdistanê û ji aliyê xwêneran ve hatiye şopandin, û li gor zanyaran ku rojname hem bo welatên Ewropayê û hem jî bo cihên wekî Stembolê, Şamê, û Bexdayê jî hatiye rêkirin, çî ku gelek niştecihên van derveran Kurd bûn, ji lewre ku rojnameya Kurdistan dikaribû ku bi saya rewşenbîr û welatparêzên Kurd astengiyan derbas bike, riya xwe bo xwêneran veke, û bibe kevîrê pêşîn bo zayîna rojamegerî û weşangeriya Kurdî li seranserê Kurdistanê.

Ji piştî rojnameya Kurdistanê jî piraniya kovar û rojnameyên kurd, ji dema Osmanîyan de û ta bi dawîya sedsala 19emîn ve, li cihên dûr û derveyî welat hatine çapkirin, û di belavkirina wan de li ser rewşenbîr û xwendevanan gelek astengî û tengasî çêbûne, lê ewên ku rojname û kovarên Kurdî derxistine, barê netewî dane ser milê xwe, û bi van xebatan hişyariyek netewî li ser bingeha çandî, di nav gelê Kurd de peyda kirine, û ew bi xwe jî bûne pêşengên sereke yê tevgera çandî û neteweyî di dîroka Kurdan de. Wekî gotina dawî, dema ku mirov di warên rojnamegerî, çapemenî, û weşangeriya Kurdî de baş birame, dê bibîne ku piraniya xebatên kevin û yê nûjen jî, du aliyên girîng didin pêş: ê yekem, pêkanîna lêkolînan li ser ziman, wêje, dîrok, çand û rewşa komelî ya gelê kurd, û yê duyem jî, ronîkirina babetên cûr bi cûr, ji bo gêspêdana têgihiştina neteweyî ya kurdan. ■

Jêder:

* Rojnameya Kurdistanê, hejmara 1ê, 22 Nîsana 1898an.

* Kurdistan (Rojnameya Kurdî ya Pêşîn), berg: 1, wergera M. Emîn Bozarslan, Wşanxaneyê Deng, Çirîya Paşîn, 1991, Sweden, r: 10

* Gotara (Rojnamegerî û weşangerîya Kurd: Di navbera salên 1898-1923 de), Redwan Xelîl, sala 2016an.

* Zeriya Wikipedia ya elîktronîk.

و جريتُ

ظننتُ أني سأنام بعمق الدهر

لماذا لا نترك أفكارنا المهترئة ونمضي؟

كل الطعنات مؤلمة قاتلة

لكن أشدّها قتلا وألما

هي طعنة الظهر

أيّ زيف نرتديه عباءة؟

أو أيّ ستارة تحجب عوراتنا؟

يتربع على عرشه، ووسائده بضّ الأجساد،

شرابه نبيذ الزهور والوعول، شعاره (البقاء

و الولاء والخضوع أو الموت)، يسوس الناس

كالبهائم

هو الاختناق؟

غيوم رمال تغطيها

تمطرنا

وحكاية الموت في بيوتنا لا تقفل

أيضيق بالناس قلب المدن؟

أم أنّ الأجساد بالقلوب تضيق؟

يا زمن الربيع الأحمر

نحبها، تحبنا الشمس و الدروب

لكنّا إليها لم نهتدي

بين مدّ و جزر توقفنا

كيف نغيّر الأشياء و القلوب وقد فقدت أو تاهت

عين الشمس؟

على مسرح الرمال نباع في سوق النخاسة

لا أدري لماذا على بساط الصحراء

دائما يجهض الربيع؟

ولماذا حين تظهر ملامح القادم تهين خيول الواد؟

و يثرثر التاريخ

تاريخ قاتم كتوم،

لعوب...

يقف في صف الجلاذ

يغيب العظام أو يخفيهم في أقبيته الدامسة

زوابع تدور في الأفق

سقط من السرير مثقلا بالهزيمة

كيف جرتني الرمال لبحورها؟

كيف تغلغت في عروقي؟

أيصير السراب حقيقة أم أن الحقيقة سراب؟

قال لي قبل قليل: ابن الرمال لن ترى منه إلا

الرمال

انهضي

قال الطفل لأمه: إن الولد الذي أكلته النار

صديقي، كان أشقرا، حينما أراه في العزاء

سأعرفك عليه. ■

NERÎNEK LI WÊJEYA KURDÎ YA JI BO ZAROKAN

(beşê duyem)

Imran Yûsiv



-Sirûdên zarokan

Bawer nakim, ti gel mîna kurdan hebe ku têkeliyeke kûr bi jîngeha xwe re kiribe, girêdana xwe bi hemû heyîn û hûrayîyên wê jîngehê bi şîwazekî hunerî derbirandibe, ne tenê têkiliyên girêdayî jiyana rojane lêbelê yên giyanî jî. Mirov zêderewiyê nake dema ku em bibêjin: ger kesek bixwaze şîwazê jiyandina kurdan û kesatiya gelê kurd binase divê li wêjeya wî ya gelêrî vegere.

Sirûdên zarokan -wek beşekî giring ji gelepore gelê kurd- ji bo axaftina me ya bûrî baştirîn mînak e.

Hemrengiyeke ciyawaz û zengîn di sirûdên zarokên kurd de heye, ev mijar bi xwe hêjayî lêkolîneke taybet û berfireh e, çiku ev sirûd, bi şîwazê xwe yî hûnandinê hem jî bi naveroka xwe dagirtî ne.

Wek ku me berê anî ziman, bi hezaran sirûdên zarokan di wêjeya kurdî ya gelêrî de hene, ji alî naveroka wan ve, em dikarin çend cûreyan li vir destnîşan bikin :

1-Sirûdên ku zarok axaftinê bi lawiran re dikin an jî bi wan re dilîzin: Hemû lawirên ku li jîngeha zarok peyda dibûn û ew bi wan re diket nava têkiliyan de bûne mijarên sirûdên zarokan, bi nîgaşeke berfireh û rewşdayîneke bedew hatine ristin. Wek mînak sirûda li ser pipinîkê ku dibêje :

Pipinîka pinpinî

Li ser darê rikinî

Pipinîka perwanî

Xeml û xêza bûkanî

Xemla bûka sor û zer

Li hev xistin bask û per

Bask û perên reqreqî

Pir tenik û deqdeqî

Deq û nexşên rengîn e

Li ser gulan datîne.....hd

2-Sirûdên girêdayî lîstokên zarokan, wek mînak sirûda Hêlanê, di vê sirûdê de çawaniya wê hêlanê, helkefta ku zarokan tê de pê dilîstin û cejna qurbanê bi çî awayî dihatê lidarxistin wek adeteke civakî ji mirov re tê diyarkin, sirûd jî wiha dibêje :

Hêlanê lêb hêlanê

Hêlanê çermê ganê

Avêt beştê kêranê

Hejandî mil hêwanê

Rojên eyda qurbanê

Keçik hatin dîlanê

Kurik çûne serdanê

Kombûne li ber zîlanê

Ka mewîjê hebanê

Xweş tê dengê quranê

3-Hin sirûd hene taybet bi dayik û mezinan e, lê ji bo zarokan tene gotin dema ku bi wan şa dibin.

Wek mînak; ev sirûda ku dê ji keça xwe ya biçûk re dibêje :

Bidim kê û nedim kê

Ez ê bidim axê êlê

Wê derkeve ji malê

Ez ê bidim kopekê êlê

Ji bo dernekeve ji malê

Lê keçikê keçikê

Xal xezûr mêr kûçikê

Li ber agrê tifikê

Li ber sîka kuçikê

Lo xwedêyo ez gorî

Çi ristek zêr û morî

Te daye me ev horî

Mîrmeleka bir jorî

4-Sirûdên kenok: ev sirûd weke rexnedayînekê ne, bi şîwazekî komîdî hatine ristin, wek mînak sirûda Mamhecî Mamheciyê mamhecî

Simbêlsoro narincî

Bi Fatê re zewicî

Tiştek xwar û beecî

Dem û sal lê xericî

Benîştê nav dirana

EZ NEÇÛME TI DERÊ

Şevîn Hesen



*E^z neçûme ti derê
tenê min çavên xwe girtine*

Ji bo ez birevim

dûrkevim

Lê.....

Ez çî bikim ji xwe !

Tariya çavên min

ji xwe ditirse

Ji pahîzê dilerize

li rohnîya te digere

Dîsa wek her car

Li hembêza te vedigere

Dîsa dilê şeva pepûk

Bi axîn û oxîna li ser te

divehise

Heyva nûşiyar

Ji dîtina te

Şewa xwe

bi şewq dike û dike

Lorîkên dayikan

ji xew radike

Ez neçûme ti derê

Der hemû

tên seyranê

li dor çavên te dîkin

Ez jî dibim der

û


Ji dûr ve

bi çavên girtî

li buhiştê dêmên te

dinêrim ■

PÊWISTIYA HILANÎNA QÛTÊ ZIVISTANÊ



Efsan Kurdî

Her sal, di vê demê de, piştî ku berhemên çandinyê bidawî dibin, buhaya fêkî û keskahiye li bazaran erzan dibe, ji bo werzê zivistanê kevaniyên malan li rojavayê kutdistanê dest bi hilanîna qûtê malê dikin, çiku zivistanê, şînkahî li bazaran peyda nabe, û eger peyda bibe jî nîrxê wan bûha ye.

Qûtê ku tene amadekirin û hilanîn evin: penêr, miriba bi hemû cûreyên wê, hişkirina xirtk û bacanen reş, kelandina genim û gelek tiştin dîtir jî.

Tevî ku piraniya van tiştan, çêkirî û amadekirî salweqat li bazaran peyda dibin, Lê xelkên rojava qîma xwe bi berhemên kargehên xwarinê nayinin, ew karê destê xwe çêtir, baştir, erzantir û xweştir dibînin.

Hinek xelk jî dibêjin ku dilê wan nabije xwarinên qutîkirî yên kargehan.

Dibe ku hilanîna hin cûreyên xwarinê ji bo zivistanê, bûye wek erkek ji erkên kevaniya malê, û her sal jê tê xwestin, Da ku malbat zivistana xwe

bi wan xwarinan derbas bikin û hinek ji xerciya malê kêr bikin.

Di derbarê vê mijarê de, Jina 40 salî Ca Alan ku ew ji bajarê Amûdê ye, ji kovara welat re axivî û got:

Ji bo qûtê zivistanê, her sal, em gelek cûreyên xwarinê amade dikin û hiltînin. Wek penêr, ava bacanan, mireba mişmiş û hejîran, kelandin bîrxul û hişkirina şînkahiê.

Ca Alan dibêje ku her kevaniyek li gorî zanebûna xwe û pereyên ku jê re peyda dibin qûtê xwe yî zivistanê hiltîne.

Di berdewamiya axavtina xwe de, Ca alan dibêje: Ê ku havînê amadekariya xwe ya zivistanê neke, ewê neçar bibe zivistanê xwarina xwe bi nîrxekî buha ji bazaran bikire ji ber ku zivistanê nîrxê şînkahiye li bazaran gelekî buha dibe.

Hilanîna xwarinê ji bo werzê zivistanê barê malbatê pir sivik dike.

Di derbarê heman mijarê de kevaniya ji amûdê Fatma xelîl ji kovara welat re axivî û got:

Armanca me ji amadekirin û hilanîna xwarinê ewe ku zivistan werzê sermahî, berf û baranê ye, şînkahiya taze li bazaran peyda nabe, û ên heyî jî pir buha ne, jixwe hin tişt bi carekê re zivistanan peyda nabin wek pelên rezan û xeynî wan.

Rast e, gelek kargeh hene wan xwarinan çêdikin û li bazara difiroşin, lê tama wan ne wek ên ku em bi destên xwe çêdikin, hem ji alî paqijîya wan jî baweriya me bi wan nayê û em nizanin ka çawa tîr çêdikin. ■

Bû nîşana neqencî

5-Sirûdên hejmartinê; ev sirûd di destpêka lîstikan de wek hejmartinekê ji bo bijartina kesê ku wê dest bi lîstikê bike, an jî lîstik lê bikeve tîr gotin û bi kar anîn, wek mînak; di lîsteka çavgiştîkê de ji bo ku zarok yekî bibijêrin da ku pêşî çavê xwe bigire jimartinê bi sirûdekê dikin, yek ji van sirûdan sirûda yek û yek e:

Yek û yek, teyrkê belek, zaza bilbil, dermanê dil, şeker û şema, li ber çema, çem miçiqî, av tîr nema, yadê pîrê, eqlê te çû, ne ji heciya, ne ji meciya, gur ketî nav qereçiya.

Ji bilî cûreyên sirûdan yê ku me anîn ziman, ji alî mijar û naveroka xwe ve bi dehan sirûdên zarokan yê rengereng hene.

-Mamik û tîderxistinok

pir mamik û tîdexistinokên taybet bi zarokan di wêjeya kurdî ya gelêrî de hene. Bi giştî, ew bi awayekî rêzbend û ritmeke mûzîkî hatine hûnandin, yekheba ji wan bi awyekî bexşane tîr gotin.

Mijara mamikên kurdî bêtir girêdayî jiyana gundan e, û tiştên ku li jîngeha gundîrî dihatin bi kar anîn, herwiha heyîn û diyardeyên xwezayê jî bûne mijarên mamikan.

Ji alî şeweyên wan ve, sê şewe mamik hene ku piraniya mamikan li gorî wan hatine ristin, ew jî evin:

1-mamikên ku bi gotina "tişteki min heye" dest pê dikin, di piştî rewşa wî tiştî lê bi regekî nexuyanî tîr dayîn, wek van mînak:

-Tişteki min heye, wek xurmakê ye, besî odakê ye, ew çî ye? (agirê lempê ye)

-Tişteki min heye, di mal de bi çek e, derdikeve tazî ye, ew çî ye? (fîşek e)

-Tişteki min heye tiştî ne, difire bask nîne, dimeşe ling nine, dixwe dev nine, ew çî ye? (şepî ye)

-Tişteki min heye tiştanî, li nav mezelê misilmanî, ji xeyrî xwedê kes pê nizanî, ew çî ye? (jina ducanî ye)

2-Mamikên xurû ku wek malikên helbesteke rêzbend hatine ristin, mînak:

-Çek reş e, ne keşîş e

Şaşik kesk e, ne derwîş e

Ez wî dixwim ne mewîj e

(bacana reş e)

-Mamikê mino mamanî

Bîr qutikê şamgêlanî

Dewla ji dêr tîr danî

Avda golên nûranî

Kevirê hûr deranî (kil û kildan, kilçiv û çav e)

3-Mamikên ku bi awyekî bexşan ne, wek mînak:

-Li kevir dixim naşkê, li avê dixim dişkê, ew çî ye? (kaxez e)

-Bi roj xulam e, bi şev xanim e, ew çî ye? (melkes e)

-Deh li diduwan, serî li qûnê, qûn li erdê, ew çî ye? (pezdoşî ye) ■

Jêderên sirûd û mamikan:

-Pirtûka (Minminîkên rengîn li nava gulên bi bîn) ya Salihê Heydo

-Pirtûka (bexçeyê tîderxistinokan ji mamikên zarokan) ya Salihê Heydo

**PEND Û METELOK
DI WÊJEYA
DEVOKÎ Û GELÊRÎ
YA KURD DE**



Gulal Kasanî

Em dikarin di pêşdanê de danasîneke kurt ji Filkilorê re bînin ziman; Filkilor ew e girûpek ji hunerên nerîtîyên baştan e, çi Çîrok, daştan, û alavên derbasbûna jiyane ye, di çarçova miletekî de xwe li pêş dixê; ji nîşkekî bo nîşkekî din têtê veguheştin; lê ew li rastî nûkirin û guherînan têtê holê, li qor pîvanên wê civakê ku pêwîst in.

Cara yekem di sala 1864 an de ew zarewa diyar bûye, dema ku zaniyarê Almaniyayê Welikyam Tomiz cara yekem bikaraniye. Kelepûr(Filokilor) ji sê beşan pêk têt :

1-Kelepûra Destanî: Ew bixwe jî dibe dûbeş : A-kelepûrên avahiyên : Mîna avahiyên ku ta roja îro berz in, wek kelh, pirr, mizkevt, kenîştan, hemû cihên perestgeh û veşartina miriyan, ta pêkerên ku bi destên hunermendên nîqarker hatine afrandin.

B- Alavên ku di şeran de hebûne û hatine bikaranîn
mîna Mancenîq, lêrdewan, şûr, mortal, tîr, û kevan.

C- Alavên ku mirov bi wan keda xwe dikir, mîna çêkirina Berran, tayîşk, cil û berg bi alava Cûmikê dihatin Tevinkirin, yan çêkirina Ta bi alava Teşiyê; ev alav bixwe jî bi destên efretan dihat karkirin yan jî alavên kar mîna cot, cercera, tapan, û dasik..hd.

2-Kelepûra Çandeyê: Ew kevnetora ku ji çanda wî miletî ye, yan jî bermahiyên miletekî dinin ji ber egrên koçberiyê yan jî şer û pevçûnan, mîna gerdiş û nerîtiyên civakî lê ji ber ku Çandeya kurdî ya nivîskî tune bûye yan pirr kêm bûye, pareke mezin dikeve beşê Devokî de.

3-Kelepûra Devokî: Çi tuştên ku di rêya devan re
têt veguheştin mîna ştran bi hemû beşên xwe ji
Şeran, Lawik, salfan, çîrok û çîvanokên evîndaran ,
dîlan bi hemû reng û şêweyên xwe, Mamik, Pend û
serpêhatiyên kal û papîran..hd.

Toreya Gelêrî ya bermayî: Di rêya Kesên afrênerên bilîmet î civakî û xwedî bîr û bawerî û bi hunerîyeke hûrbînî heşt, çêş, û radeya hişiyarî ya gelêrî bi şêweyekî pêşwend û hevpesend hatine hûnandin. Ew bi xwe hizra qilêr î niştîmanî ye, ji ber ku toreya

gilêrî pêwîstdarê veguheştin û berdewamiyê
ye, ev herdû endam jî ji naverok û wateya
Torevê ne.

ji ber ku kelepor bi xwe hizra zindî ye, ji yekta kes û civakê re bi eger e, bo nasnama wan ji aliyê çandê ve yan ji aliyê şarişaniya Gelekî ji gelên Cihanî.

Kelepûr ji Du biran par ve dibe: Berê Derûnî û
Berê Mayekî (Keresteyî) Madî.

Beşê Derûnî: Ew tiştên ku girêdayîne bi rewşa mirovan ya derûnî heştekarî ve

ji Mozîk, stran, mamik, çîrok..hd.

Beşê Meyekî: Ew tiştên ku li deveran bi cih kirîne, ji me ve bi parmistî in em pê bi hêstdar in, ji çavê me ve xwiya ne, mîna alavên gedîkirîna Ejelan, avahiyên berê, amûrên kedkariyê.,

4-Kelpûra Suriştî: Weke ku zaniyarên entîkan dibêjin cih û warên suriştê bixwe jî dikevin lîsta kelepûrê de, mîna paravên yên deryayan, zincîrên çîyan, nijadên cinaweran , xulpelêlên zixuran, xur û cihên îêrzemînan ..hd.

Mamik Di jiyana Gelan de:

Xelîlê Çaçan dibêje: "Janreke wê Flokilorê gotinên pêşiyên in. Gotinên pêşiyên di nava janrên Flokilorê de yên lap e, belavbûyî ne. Ti Çîrokan, kilaman, lêgindan (efsane), beyt û serhatiyên em nikarin hemberî gotinên pêşiyên bikin, ji ber ku ew bi massayî (giranî) tîne gotin, ew bi carekê re bersiva gelek pirsên lazîm didin û her wextan, bi her meniyên tîne gotin»

Mamik(Gotinên pêşiyar), amûreke devokî bûye bo veguheştina raman, hizir, û têgihiştinê gelan ji qonaxeke dîrokî ta qonaxeke din ji jiyana wî mîletî, ji asteke hişmendiyê bo asteke din ji wê nasnameya xwe ya zaniyarî; di wê hemdema ku jinû ve jiya ye, ji bilî ku Mamik bixwe jî çanda wî ya şarîstanî, û pileya hişyariya heynî bibûye.

Gelek pergalên veguhêza derbirîna heşt, bawerî, karan e, û pêweştdariya berdewama jiyana her miletê de hene, da ku ew millet bi sîfîleke rewa yan raşteqîn e, tevger û têkiliya xwe ya navxweyî birêve bibe, ev jî aliyakî ve û jî aliyê din ve Mamîk dibe mîna Eynikekê jî civaka milltan re, di wê re diyardeyên gelêrî bi hemû şêweyên xwe, jî gerdiş, rêwîti, û wêneyên afsanî, ta oldarî têtine berçav dema ku bi dilekî mirovî qewde dibe.

Mamik, ji endamên serekene di çandeya gelerî ya gelan de, ji ber ku di rêya wê re hemû şêweyên jiyane û eger û pêwîstîdarên bi wê

36 سنة ولم تفتد المنطقة الصناعية الجديدة في مدينة الحسكة

ریباز عبّو

ولأسباب متعددة منها قلة التمويل الذي كان يصل من الإدارة المحلية لصالح الحسكة وكان بعض الحرفيين القدماء وأصحاب النفوذ يحاولون تأخير مشروع المنطقة الصناعية الجديدة لارتباطهم بمركز المدينة من حيث السكن ومحلاتهم الصناعية.

في السابق قامت بلدية النظام بتخصيص محلات في المنطقة الصناعية الجديدة لغير الحرفيين والصناعيين مما سبب امتعاضا لدى أصحاب المهن الحقيقيين ،حول ذلك يقول الميكانيكي شيمخوس حسن إن بلدية النظام قامت بتخصيص بعض المحلات في المنطقة الصناعية الجديدة للأطباء، متسائلا ما علاقة الطبيب بالمحلات الصناعية الا لكي يشارك أصحاب المهن الصناعية في رزقهم ويقوم ببيع المحلات بسعر مضاعف ليستفيد من تجارتها.

منذ سبع سنوات مع بدء الأزمة السورية أصبحت المنطقة الصناعية الجديدة تحت إدارة بلدية الشعب التابعة للإدارة الذاتية في شمال سورية وقد قامت بلدية الشعب بوضع إجراءات من أجل حصول المهنيين الفعليين على المحلات وعدم احتكارها من قبل التجار غير إن إكمال تنفيذ هذا المشروع يحتاج إلى المزيد من المال والتزام أصحاب المحلات بتسديد الاقساط المترتبة عليهم لتنفيذ و إكمال المشروع و ما يحتاجه من تمديد شبكة كهربائية وكذلك صرف صحي إضافة إلى نقل المياه الصالحة للشرب عبر أنابيب من مدينة الحسكة إلى المنطقة الصناعية الجديدة .

وكلما تأخر تنفيذ المنطقة الصناعية الجديدة زاد عدد المحلات الصناعية في الأحياء أيضا فالمحلات الصناعية موزعة بشكل عشوائي على كامل أحياء الحسكة و العدد في تزايد مستمر مما يتسبب بالتلوث و الضجيج للمواطنين القاطنين في منازل قريبة منها.

لقد أصبحت المنطقة الصناعة القديمة في الحسكة تسبب مشاكل للسكان في المدينة كما إن المحلات الصناعية المنتشرة في الأحياء قد حولت مدينة الحسكة بأكملها إلى شبه منطقة صناعية هذا يجعل من تنفيذ مشروع المنطقة الصناعية الجديدة ضرورة ملحة لحل الكثير من المشاكل الناجمة عن فوضى انتشار المحلات الصناعية.



فوضى انتشار المحلات الصناعية.

مضت ستة وثلاثون سنة على المباشرة في تنفيذ المنطقة الصناعية الجديدة في الحسكة ولم ينته تنفيذها بعد وكأن أياذ خفية تنقصد عرقلة هذا المشروع وليس لها مصلحة في الإتمام

يقع مشروع المنطقة الصناعية الجديدة شرق دوار معمل الغزل على بعد خمس كيلو مترات عن مركز مدينة الحسكة تبلغ مساحة المشروع 800 دونم بنسبة انجاز ما يقارب 80 في المائة. رغم إن المنطقة الصناعية القديمة صغيرة ولم تعد تستوعب عدد الآليات التي يتم إصلاحها وتسبب ضجيجا وتلوثا بيئيا يعاني منه المواطنون القاطنون حول المنطقة علاوة على ذلك فإن هذه المنطقة الصناعية تحدث أكبر ازدحام للسيارات في دوار الصناعة وكذلك في دوار مرشو والطرق الفرعية المؤدية إلى المنطقة الصناعية بسبب كثرة عدد الآليات الداخلة إليها والخارجة منها كونهما تقع في مركز مدينة الحسكة حول ذلك يقول وحيد موسى صاحب محل بطاريات في المنطقة الصناعية القديمة إن هذه المنطقة الصناعية تأسست في الماضي في الوقت الذي كانت مدينة الحسكة صغيرة وقليلة الكثافة السكانية وبالتالي كان عدد السيارات قليلا جدا أما اليوم فلا تستطيع استيعاب هذا الكم الكبير من السيارات إضافة إلى إن الشوارع التي تقطعها ضيقة جدا وتسبب ازدحاما شديدا وفي كل مدن العالم تكون المناطق الصناعية خارج المدن و الأحياء السكنية لكن فقط في الحسكة مازالت المنطقة الصناعية وسط الأحياء السكنية . وسط صعوبة الاستمرار بالعمل في المنطقة الصناعية القديمة أصبح إخراج هذه المهن خارج المدينة ضرورة ملحة فقد كانت بلدية النظام السوري هي صاحبة المشروع قبل 36 سنة ولكن البلدية لم تستطع إكمال المشروع البالغ عدد المحلات فيه 2010 محلا تناسب العديد من المهن الصناعية



المؤسسات الاجتماعية.. ونشر ثقافة التسامح

إننا أحوج ما نكون في هذه الأيام لنشر ثقافة التعايش السلمي، وترسيخ مفاهيم متعلقة، كالتسامح والتصالح والإخاء، وإلى وعي حقيقي بهذه الثقافة وتكريس قيمها في سلوكياتنا وتعاملاتنا، لذا فالحاجة ملحة لتضافر الجهود بين الجميع إلى غرس المفاهيم الحقوقية، وتعزيز قيمها ونشرها بين أبناء الوطن. ويحتاج الأمر إلى الأفعال أكثر من الكلمات، لأن مبدأ التسامح الحقيقي يكمن في الثمرة السلوكية العملية.. إنها مسؤولية مجتمعية تشاركية، وواجب يتقاسمه الآباء والمثقفون وعلماء الدين، وكل مؤسساتنا الاجتماعية والثقافية والإعلامية:

– الأسرة: تشكّل الخلية الاجتماعية الأولى في بناء المجتمع، والحجر الأساسي من استقراره وتقدمه، وهي –بطبيعة الحال– أهم الجهات المسؤولة عن تشكيل شخصية الطفل وتوجيهاتها، حيث تبدأ فيها التأسيس للمفاهيم الثقافية الأولية، وإكتساب مجموعة المعايير والقيم والعادات في المجتمع، وفيها يبدأ التعريف بقيم التسامح وقبول الآخر، وذلك عبر تسامح الأبوين مع بعضهما، ومع الأولاد والحيوان والأصدقاء (القدوة الحسنة). والتسامح أخيراً قيمة من واجب الأسرة غرسها في نفوس أطفالها، وجعلها من الدعائم الأساسية التي تقوم عليها أخلاقياتهم وتعاملاتهم.

– المدرسة: المدرسة هي مؤسسة اجتماعية لها أثرها الفعال في مختلف جوانب شخصية الطفل، وهي تأتي بعد الأسرة من حيث الأهمية، إذ تسهم في تنمية خبراته وتوسيع مداركه وتوجيه قدراته. وفيها يتعلّم بعض المعايير والقيم الاجتماعية الجديدة، ولعل التسامح أفضل القيم التي يجب أن يعرفها ويتمثلها في هذه المرحلة.

– المؤسسة الدينية: يمكن لهذه المؤسسة أن تلعب دوراً كبيراً في إشاعة قيم التسامح واحترام التعددية وتقبلها، والإسهام في إحداث التغيير المجتمعي، ذلك عبر الخطب والدروس والمواظع، وبعض الأساليب الأخرى.

– منظمات المجتمع المدني والمؤسسات الحقوقية الأهلية: بمقدورها أن تغرس فكر التسامح في الذهنية المجتمعية وتعهده بالنماء، عبر التوعية بقضايا حقوق الإنسان، وتعزيز المبادئ الإنسانية المشتركة، التي تسمو فوق انتماءات الجنس أو اللون أو المعتقد، وهذه خير وسيلة لتنمية ثقافة التسامح ونشرها على نطاق واسع.

– المؤسسات الإعلامية: تؤدي وسائل الإعلام بوصفها كبرى المؤسسات الثقافية التربوية في المجتمع دوراً بارزاً في تحديد ثقافة الإنسان، وإكسابه القيم والاتجاهات، لذا يمكن استغلالها في إبراز القضايا الحقوقية، وغرس قيم التسامح والتصالح والحوار، وطرح المفاهيم التي تؤكد على هذه القيم. كما يمكن استغلال هذه الوسائل باختلاف أنواعها لتعزيز دور الجمعيات والمؤسسات المدنية والحقوقية.

إن الشعوب والأمم العظيمة هي التي تدرك أنّ سرّ قوتها في محبة أبنائها وتسامحهم فيما بينهم، فتحتمي بذلك مجتمعاتها ومكسباتها، وتصنع لأجيالها حاضراً ومستقبلاً أفضل، بل تشكّل –من خلالها– جسوراً متينة بين مختلف الثقافات والحضارات.. إننا بالتسامح والمحبة والسلام وروح التعايش المشترك بين أبناء الوطن، على اختلاف عقائدهم وثقافتهم وطبقاتهم الاجتماعية، وتعزيز ثقافة حقوق الإنسان بمختلف أشكالها، نعبّر عن إنسانيتنا كما أراد لها الله سبحانه، ونرتقي بأنفسنا كما يجب أن يكون، ونصنع حياة أكثر أمناً وسعادة، نملؤها المحبة والأمن والسلام، ويسودها العدل والحرية والمساواة.

دور المؤسسات

الاجتماعية في نشر

التسامح

جميلة محمد



مفهوم التسامح ظهر عقب الصراعات الدينية بين الكاثوليك والبروتستانت، التي انهدمت المجتمعات الأوروبية منذ مطلع القرن السادس عشر، واستمرت حتى أواخر القرن الثامن عشر، وقد برز خلال هذه الفترة بعض الفلاسفة والمفكرين والمصلحين ممن اهتموا بمخاطبة العقل الإنساني، كديكارت، وسبينوزا، ولبنتز، وهيوم، وكانط، إلا أن أهمهم في تلك الحقبة كان جون لوك، الذي أرسى الأسس الفلسفية لحقوق الإنسان، التي تجلّت في كتابه: رسالة في التسامح، وأهم ما تضمنته تساوي الناس في الحريات والحقوق. ثم أتى بعده فلاسفة التنوير في القرن الثامن عشر، وطرحوا مجموعة من الآراء حول التسامح، ودأبوا على إشاعة أفكاره وإرساء قيمه ومبادئه، لتشمل مجالات الفكر وحرية التعبير والمواقف السياسية، ومنهم: فولتير، وروسو، وديدرو، هكذا حتى تبلورت هذه الأفكار أواخر القرن التاسع عشر كمبادئ أساسية للتسامح، وشكّلت إرهابات لبزوغ الإعلان العالمي لحقوق الإنسان عام ١٩٤٨. ثم أصبح صفة شاملة تُعرف بها ثقافة سياسية متحضرة، وسلوك اجتماعي مميّز، مضاد لكل صفات الاستعلاء والتفرقة والتمييز العرقي والديني والاجتماعي.

